

Mihemed Emin Doskî

**Salek Borî û Salek Hat**

Salek borî û salek  
hat  
Kepirek dî bo we  
xelat  
Bi cil û bergekê dî  
Bi rewş û rengê dî  
Zarokê ciwan û jîr  
Kepirê neke tu ji bîr  
Perên wê di rengîn  
in  
Bi babetan zengîn in  
Navdar û ji zanistî  
Ji himbêza siroştî  
Balindek Kurdistanî  
Welatekê cîhanî

Bo çûnên we zarokan  
Nîgarên we xişkoka  
Berîkane û seyrê rast  
Çîrok û tiştê bi ast  
Tiştîkê min û hozan  
Ji leşî û peyva ciwan  
Eve ne babetên wê  
Gewher û sixletên wê  
Li hemî serên heyvan  
Li we dê bîte mêhvan  
Mêhvanekê berêz e  
Bo we zanîn û hêz e



## BABO

## DADÊ

### Peyv

Helbest: Ono Kaylas (Helbestvanekê Fîlandî ye)  
Wergêran: Mueyed Teyib

Gelek peyv hene  
 Peyv dijîn  
 Ez wan dibînim  
 Hindek di kirêtin û hindek di ciwanin.  
 "Dadê" peyveka gelek dilovan e  
 Ya xweş e, wek maçên biçûk  
 Ew xweştirîn peyv e.  
 "Babo" jî peyveka gelek xweş e  
 Lê hindek cara wek birûsîyê dipeqît.  
 Hîngê ya baştir ewe mirov xwe li pişt  
 dergehekî veşêrît.  
 "Havîn" peyveka gelek germe  
 Mirov hemî sipêdeyan  
 Di nav gîya û komên xîzî da dibînît.  
 "Cîhan" peyveka gelek mezin e  
 Cihê wê di mejîyê mirovî da naket.  
 "Dar" gelekê kirêt û bi êşe.  
 Mirovan peyvên vala jî hene  
 Peyvên kes tê negehît  
 Wek mirin û gunehê  
 Ku kes tê nagehît  
 Lê hemî jî jê di tirsin.

